Wezareta federal
bona Xêzanê, Mirovên kal,
Jinan û Ciwanî

BUNDESSTIFTUNG
MUTTER und KIND
Schutz des ungeborenen Lebens



# Weqfa federal ya
# Dayk û Zarok

**Weqfa Federal kengê alîkarî dike?**
Hun di rewşeke zehmet de ne û li benda zarok in? Ku wisa be hun dikarin ji bo alîkariyên Weqfa Federal di ofisa şêwirmendiya ducanan de daxwazê pêşkêş bikin, heke

a) navnîşana we an îqameta normal a we li Almanya hebe,
b) belgeya ducanbunê, mînak: **„Mutterpass“ karta dayikêtiyê ya we hebe û**
c) hun di rewşa xerab û teng a şexsî û aborî (madî) de bin.

Ji bo alîkariyên aborî pêwist dike ku qezencên (gelir) a we çiye were kontrol kirin. Alîkariya Weqfa Federal tenê wê demê tê girtin, dema alîkariyên sosyalê, herwûsa pereya Sosyalê têr neke, heke di dema xwe de neghîje an jî mafê we ji bo girtina wê alîkariyê tune be. Ji bo girtina alîkariya aborî serî li ofisa şêwirmendiya ducanan bixin û daxwaza xwe, di çarçuva şêwirmendiya şexsî de pêşkêş bikin (ne li ba ofisa Weqfa Federal li Berlînê). Ofisa şêwirmendiya ducanan – herwûsa li nêzî we jî - hun dikarin di rêbera Telefon û di înternetê de wê peyde bikin (mînak. https://www.bundesstiftung-mutter-und-kind.de/antragstellung/). Li ser bixebitin daku di dema xwe de randavuya şêwirmendiyê bigrin, ji ber ku serlêxistin û pêşkêş kirina daxwazan di dema ducaniyê de çêdibin. Ji bo her ducanbûnekê tenê yek daxwaz tê pêşkêş kirin.

**Weqfa Federal çawa alîkariyê dike?**
Alîkariyên weqfê ji bo hin pêwîstiyên weke tiştên ku di destpêkê de ji bo zarokê we hewce ne, berdewamiya aboriya malê, mal û haziriyê, herwûsa ji bo ku li zarok were nêrîn, tên dayin. Alîkariyê weke qezenc li ser pereya bêkarî II (Arbeitslosengeld II), alîkariya sosyalê û alîkariyên din ên sosyalê, nayê hesibandin.

Alîkarî çiqas e û çend dom dike ev girêdayî rewşa we ya şexsî ye, lê herwûsa piştî dayina giştalîkariyên kesê ku daxwaza rewşa acîl pêşkêş kiriye. **Mafê qanunî** li hember alîkariya aborî ya Weqfa Federalê tune ye.

Hukumeta Federal her sal ji bo piştigirtina madî ya programa alîkariyên wê herî kêm 92 mîlyon Euro dide Weqfa Federalê. Alîkariyê Weqfa Federal **ji bo jinên ducan di rewşa acîl de** bi rêya weqfên herêmî ji bo jin û malbatên di rewşa acîl de û navendên mîna wê, li herêmên federal çêdibin. Ew dayina wan alîkariyan li cihê we ya runiştinê jî rêkdixin.

Bi rêya Weqfa Federalê „Dayk û Zarok – Parastina jiyana ne ji dayikbuyî“ her sal 150.000 jinên ducan di rewşeke acîl de bi awayeke ne bîrokatî tên piştgirî kirin, daku berdewambûna ducanî û lênihêrîna zarokên biçûk hêsan bibe.

Hun bi alîkariyek dikarin piştgirî bidin karê Weqfa Federal Dayk û Zarok: IBAN: DE44 3708 0040 0270 2009 00, BIC: DRESDEFF370. Ewan alîkariyan dikin ku jinên ducan di rewşa acîl de pir ber bi başî biçin û hun dikarin ji bac (vergi) ya xwe jî qut bikin.

Bingeha ji bo Weqfa Federal, ku sala 1984 an de çêbuye, qanuna çêkirina weqfekî „Dayk û Zarok – Parastina jiyana ne ji dayikbuyî“ ye.

**Hun ev agahî û agahiyên din li vir dibînin:**
**www.bundesstiftung-mutter-und-kind.de**

Ev belavok pareke ji karên gelemperî yên Hukumeta Federal e:
bê pere tê belav kirin û ne ji bo firorinê hatiye amade kirin

**Amadekar:**
Bundesministerium
für Familie, Senioren, Frauen
und Jugend
Referat Öffentlichkeitsarbeit
11018 Berlin
www.bmfsfj.de

**Ji ku tê temîn kirin:**
Publikationsversand der Bundesregierung
Postfach 48 10 09
18132 Rostock
Tel.: 030 182722721
Faks: 030 18102722721
Telefona zimanê işaretan: gebaerdentelefon@sip.bundesregierung.de
E-Mail: publikationen@bundesregierung.de
www.bmfsfj.de

Ji bo hin pirsên din telefona me ya servîsê bigerin:
030 20179130
Roja Duşemê heta Pêncşemê saet 9-18‘an
Faks: 030 18555-4400
E-Mail: info@bmfsfjservice.bund.de

Telefona meqamê bi giştî: 115*

**Hejmar:** 4FL204
**Dem:** çile 2018, Çapa 1. emîn (Kurdisch)
**Dîzayn:** www.avitamin.de
**Wêne:** Andy Kuechenmeister
**Çapxane:** MKL Druck GmbH & Co. KG

* Di derbara pirsên we de ji bo hemu birêvebiriyan û rayadaran, hun dikarin ji Duşem heya Pêncşem di navbera saet 08 û 18 de peywendî bi hijmara hevpar ya rayedaran 115 re daynin. Di herêmên ku beşdarî wê projê dibin, hun dikarin navbera saet 8.00 û 18.00 xwe bigihînin hijmara 115‘an. Hun dikarin him bi telefona malê him jî bi telefona berîkê ji bo pereya herêmî û li ser flatrate ya telefonê beleş xwe bigihînin hijmara 115‘an. Mirovên kerr û lal dikarin ser adrea SIP 115@gebaerdentelefon.d115.de xwe bidin agahdar kirin. Ji bo gahdariyên zêdetir li ser hijmara hevpar ya rayedaran 115 û ka ev telefon li herêma we jî girêdayî ye yan na, li vir binêrin: http://www.115.de.